



Dûrzan Cîrano
Şikeftên Hîlarê | Erxenî | Dîyarbekir



Hejmarê 3. | Îlon, Çirîya pêşîn, Çirîya paşîn 2019

folklorame

folklorame

Zargotin pişt e, folklor her tişt e! Hejmarê 3. | Îlon, Çirîya pêşîn, Çirîya paşîn 2019

Biha: 15 ₪





Çirokbêj Diya Fatma, (1929 / -)



Hîlmi Akyol
(1960 / -)

folklorame





SPAS JI BO
ALÎKARÎYA WAN
Bîlal Guldem
Dûrzan Cîrano
Elî Ugur
Eşref Bolumcu
Ferhad Aslan
Hemin Omar Ahmad
Mazlûm Sîyabend
Orhan Tanhan
Ridvan Başkurt
Selmet Guler
Tehsîn Baravî
Ugur Sermîyan
Zeynep Yaş

TÊKILÎ

folklorame@gmail.com 
folklorame   

Her nivîskar ji nivîsa xwe
berpîrsiyar e.

Kovara folklorê ya sê mehane

Sal: 1

Hejmar: 3

Xwedî: Li ser navê Weqfa Mezopotamyayê, Selîm Olçer

Berpîrsa Nivîsan: Gevriye Atlî

Edîtor: Eşref Keydanî

Redaksîyon: Evîndar Şevîn

Desteya Weşanê:

Celîlê Celîl

Bêrîvan Matyar

Elîf Gunduz

Evîndar Şevîn

Mem Mukrîyanî

Zîya Mukrîyanî

ISSN: 2667-6443

Grafîk: Sevinç Adıyaman

Wêneyê bergê pêş: Orhan Tanhan

Wêneyê bergê paş: Dûrzan Cîrano

Navnîşan: Weqfa Mezopotamyayê

Mezopotamya Eđitim Bilim Sanat Sađlık ve Kùltùr Vakfı

İktisadi İřletmesi

Urfa Yolu Üzeri, Serhat Plaza A/blok

Kat: 11 No: 29 Kayapınar/Diyarbakır

Sertifika No: 42382

Çapxane: Aliođlu Matbaacılık Bas. Yay. ve Kađ. San. Tic. Ltd. Őti.

Orta Mah.Fatin Rùřtù Sk. No: 1-3/A Bayrampařa-İstanbul


Tel: 0212 612 95 59

Sertifika No: 16919



Pirtûka pêşnîyazkirî

Navê pirtûkê: Melayê Meşhûr
Nivîskar: M. Emîn Bozarslan
Weşanxane: Deng



Naverok

- 5 Ji edîtorî
- 6 Navên kanîyên Çîçika, **Bêrîvan Matyar**
- 11 Şêxigo Malî, **Dildar Botî**
- 16 Navên jin û mêran li Meletîyê, **Mahîr Êgûr**
- 18 Çend ser genim çend ser tirî, **Gulgenima Bênderê**
- 19 Du lîstik ji lîstikên kurdan, **Nûredîn Vûral**
- 20 Sitya Mamê, **Cemîl Çelîk**
- 22 Çîrokên biwêjan-2, **Asmîn Êyanîk**
- 25 Xaçepirsa folklorê, **Oktay Altûn**
- 26 Hevpeyvîn bi aşîqê zargotinê ra, **Eşref Keydanî**
- 34 Navên çûkan li Xendeka Botanê, **Rênas Xendekî**
- 42 Hotik, **Xecê Bîşeng**
- 44 Temîya bavê, **Mihemed Selîm Bedirxan**
- 47 Mihemedê xulam, **Vîldan Sevîm**
- 53 Qulingê Evdalê Zeynikê, **Nîhat Oner**
- 58 Peyvên kêmnas yê Pasûrê-3, **Bahoz Baran**
- 62 Danasîn û nirxandina pirtûka Kevneşopîyên kurdan, **Evîndar Şevîn**
- 66 Lîstikên zarokan li gundê Qazîyê-1, **Yaşar Eroglû**
- 78 Ferhengoka Agirîyê -1, **Firat Keklîk**
- 82 Peyvên rezvanîyê li Devera Kercewsê, **Hejar Dilbirîn**
- 86 Çar meselokên Xîya, **Elîf Gunduz**
- 88 Méyof û mahi, **Hikmet Yildiz**
- 94 Nav û taybetîyên hin cureyên gîyayî li Mêrdînê, **Mem Mûkrîyanî**
- 98 Qewlêrk ji Giteya Silopyayê, **Xalid Celalî**
- 102 Mîyanê şarî de nameyê nêweşîyan û weşkerdişê înan, **Surya Human**
- 106 Patîkên Cemîle Yaşê, **Zeynep Yaş**
- 108 Çarerkirina rûyên xirabker û neciwan li nik zarokî
bi rêya bawerîya li Devera Behdînan da, **Cemîl Şelazî**

Xwendevanên ezîz û xweşdivî, em dizanin ku we bêriya me kirîye. Me jî bêriya we kiribû û va ye em hatin. Hejmara sêyem, hejmara payîzê niha li benda we ye ku hûn devê wê vekin û bixwînin.

Di xebatên kovargerîyê da, mirov gelek tiştan di rê da hîn dibe û rê, mamosteya tewrî baş e. Em jî gelek tiştan hîn bûn di van du hejmarên xwe da. Nas û dostên hêja, berhevkar û lêkolînerên folklorê kurdan, xwîner û şopînerên me li ser babetên cuda cuda gelek rexne û pêşniyarên xwe çî bi devkî çî bi nivîskî bi me ra par ve kirin. Em bi halê xwe kêfxweş in û em daxwaza domandina rexne û pêşniyazan dikin ji her kesê ku kovar digihîje ber destê wê/î. Hin rexne li me hatin kirin ji ber bikaranîna têgiha 'gotox'ê. Em jî li ser niqaşên xwe yê berê û li ser pêşniyaran hûr bûn û gihîştin encamekê. Biryara me ew e ku em dê têgiha 'zarbêj'ê biemilînin ji bergînda têgiha gotoxê ve.

Herweha di her du hejmarên borî da, me têgiha lihevanînokê bi kar anîbû bi mebesta binbeşeka helbesta gelêrî ya sêrêzî yan jî çarrêzî. Li ser vê têgihê jî di 'Civîna sêyem ya Term û Têgihên Folklorê Kurdan' ku ji aliyê Weqfa Mezopotamyayê ve hatibû birêvebirin da, li ser têgiha 'qewlêrk'ê yekrêzî çêbûbû. Me dil heye ku ji vir û bi şûn da em vê têgihê bi kar bînin.

Dîsa di vê hejmarê da heta ji me hat, me fotoyên gundên ku berhevkarên me li wî gundî berhevkarîya keresteya xwe kirine, peyda kirin û di kovarê da bi cih kirin. Ji ber ku bi qasî keresteya ku dane hev, ew cihwarê ku ew kereste lê tê gotin jî giring e. Banga me li tevahî berhevkar û xebatkarên qada folklorê ew e ku heta ji we tê fotoyên zarbêj, alav û amûr, gîya û lawir, gund û navçeyan zêde zêde bikişînin û wan xweşikî qeyd bikin.

Di vê hejmarê da, hûn dê rastî hin xebatên cuda bînin. Rênas Xendekî, li ser navê çûkên li Botanê nivîsiye, Mem Mûkrîyanî ketîye pey nav û taybetiyên hin gîyayên Mêrdînê, Mahîr Ugurî jî berê xwe daye navê jin û mîrên Meletîyê. Li gel van berhevkarê dilsoz Oktay Altûnî ji bo we xwîneran xaçepirsa folklorê amade kirîye.

Keresteyên ji Panos, Pasûr, Behdînan, Sêrt, Agirî, Erxenî, Colemêrg, Qereyazî, Kercews, Silopya, Farqîn û Cizîrê hatine dê bîra me kûrtir, zanîna me zêdetir bikin. Guh bidin Evdalê Zeynikê ku seh bikin çawa dilorîne li ser qulingî. Sitya Mamê bixwînin û jinxasê nas bikin ku çawa şer dike bi bav û birayê xwe ra ji bo evîna xwe.

Heta berfa sor ne, heta berfa vê zivistanê, de bi xatirê we.



Navên kanîyên Çîçika

Qeydkirina navên kanîyan bi du awayan e. Yek jê li gor fonksiyona kanîyê, ya din li gor ednîgarîyê ye ku kanî li gundî ye yan jî dûrî gundî ye. Me li gor wê, ev nivîs amade kir. Derheqê hin kanîyan da tu agahî tune bûn, hin kanî jî agahîyên van piçek piçek bûn. “Kanîya Simo” û “Kanîya Ewînatê” xweyî agahîyên berfireh bûn.

Herêma: Çîçika/Farqîn/Dîyarbekir
Dîroka berhevkirinê: 2019

Amadekar û berhevkar: Bêrîvan Matyar

Amadekar:
Eşref Keydanî

Hevpeyvîn
bi aşiqê
zargotinê ra

folklorame

Bavê min stranên dengbêjîyê digotin. Lê ne ji xelkê ra. Ji me ra û ji nas û dostan ra digotin. Dêya min û xwişka min jî pir dengxweş bûn. Birayê min ê mezin jî wekî dengbêjî digot. Dêya min pir tişt zanîbûn. Bi rastî kalê min, yanî bavê dêya min, wî pir tişt zanîbûye. Lê wexta min xwe gihandê nexweş bû êdî, nikarîbû bigota. Ji malbata dêya xwe, min gelek berhevkarî kir û min ew kirin pirtûk. Ji ber ku di nava malê da gelek kesan çîrok û stran digotin ev eşq li min peyda bû. Min ji wan hez dikir û guhdarî dikir. Li mala me jî gelek kaset hebûn, min guhdarî dikirin.

Îcar jî berê me li paytexta dilan, li bajarê Amedê ye. Li Amedê kedkarekî folklorê kurdan heye ku wî emrê xwe terxan kirîye ji bo berhevkarî û zargotina kurdan. Wî di bin şert û mercên dijwar da dest bi vî karî kirîye û îro roj li Mala Dengbêjan ya Amedê ye. Bajar bi bajar gerîyaye, ji Cizîrê heta bi Zaxo û Mûsilê. Wî kaset û plak dane hev, wî teyb girtîye û berê xwe daye gundên derdora Amedê. Wî mala xwe kirîye hêwana dengbêj û çîrokbêjan. Ew ketîye pey şopa stranên dawet û dîlanan, pey pêkenok û serhatîyên diz, derewkar, qolcî û sofîyan. Xweşbêja me ya îcar bi kek Hilmî Akyolî ra ye.

Li devê derîyê Mala Dengbêjan ez liqayî Dengbêj Hecî Şerîfê Farqînî hatim û me hal û hewalê hev pirsî. Piştî ku min got ez ji bo hevpeyvînê hatime, dengbêj Hecî Şerîfê Farqînî li ser min û kek Hilmî ev dîlok got.

Hecî Şerîfê Farqînî:

Dem û dewran çêbîye

Eger ku tu li min pirs bikî navê min Hecî Şerîfê Farqînî ye

Min bala xwe dayê birakê Hilmî

Mala Dengbêja çêkirîye

Dengbêja temamikê li hevûdinêka top kirîye

Ji dengê dengbêja pirtûk çêkirîye

Min mêze kir piştî nîvro bû, xortekî kete hundir û fanolîkî sor lê bîye

Hat ku Hilmî pirs kirîye,

Min wiha li bejn û bala wî mêzekir, zirav û dirêj bîye

Guzlika wî li nava serî ye

Gava ku rastî Hecî Şerîfê Farqînî hatîye


Vê dîloka hanêka jê stendîye

Eger ku zeman hebe, evê dîloka hanêka di deftera xwe da nivîsandîye

Wii de quling, Evdal go qulingo mala le sewinjo, biher e cira a duka
Tu rabe eave nira kor e, koka baske le si estine ser, baske e cira a duka
Were mi dua bikin ji, Xalike alina, ji zujarai Ce, baske e cira a duka
Weke caran Evdal rana kela li clajare, diwani, minich Xeni e baske e cira a duka
Weye li nira, weye li nira, weye li nira, weye li nira, weye li nira
Wii de quling, qulingo mala le sewinjo, biher e cira a duka
Eke ras, qulingo mala le sewinjo, biher e cira a duka
Makel sewinjo, qulingo mala le sewinjo, biher e cira a duka
Zilamen Emayyan bi girede, qulingo mala le sewinjo, biher e cira a duka
Danne zente li, Xanira u, qulingo mala le sewinjo, biher e cira a duka
Tu rabe ber du basken xwe biernu, qulingo mala le sewinjo, biher e cira a duka
If Zozanen, Hewarda, qulingo mala le sewinjo, biher e cira a duka
E nira be waje, qulingo mala le sewinjo, biher e cira a duka

Qulingê Evdalê Zeynikê

Nihat Oner ▶





Min got dinya dinyayeke çawa ye. Berê me nedizanî Evdal kurê kê ye. Niha jî em mezin bûne, ketine pey rêç û şopa Evdalî. Xwezî niha kalikê min sax bûya, min ê jê ra qala Evdalî bikira. Min ê bigota, “Kaliko, Evdal li gor texmînan di salên 1800an da li navçeya Agirîyê Dutaxê li gundê Cemalwêrdîyê hatiye dinyayê. Navê bavê wî Mistefa, navê kalikê wî Hesên, navê bavê kalikê wî jî Silêman bûye. Dema ku Evdal sê salî bûye, Mistefayê bavê wî mirîye. Dîya wî ew mezin kirîye. Lewma xelqê gotîye Evdalê Zeynikê. Evdal, ji sed salî zêdetir jîyaye.”

Wexta ez li Panosê mala ap Zibêti bûm, me qala Evdalê Zeynikê dikir. Di nava axaftinê da kalikê min hate bîra min; dema ez zarok bûm, kalikê min ji min dipirsî, “Evdalê Zeynikê kurê kê ye?” Di serî da min bersiva vê pirsê nizanîbû. Paşê piştî ku ez hinekî mezin bûm, min fêhm kir ku Evdal kurê Zeynê ye. Jixwe digot Evdalê Zeynikê.

(1) Min got dinya dinyayeke çawa ye. Berê me nedizanî Evdal kurê kê ye. Niha jî em mezin bûne, ketine pey rêç û şopa Evdalî. Xwezî niha kalikê min sax bûya, min ê jê ra qala Evdalî bikira. Min ê bigota, “Kaliko, Evdal li gor texmînan di salên 1800an

da li navçeya Agirîyê Dutaxê li gundê Cemalwêrdîyê hatiye dinyayê. Navê bavê wî Mistefa, navê kalikê wî Hesên, navê bavê kalikê wî jî Silêman bûye. Dema ku Evdal sê salî bûye, Mistefayê bavê wî mirîye. Dîya wî ew mezin kirîye. Lewma xelqê gotîye Evdalê Zeynikê. Evdal, ji sed salî zêdetir jîyaye.” Min ji kalikê xwe ra weha kurt bikira, dê gelekî şad bibûya.

Çend sal berê, hevalê min Fatîhî ji min ra got, “Em biçine Panosê, li wir xizmekî me heye, di derbarê dengbêjan û dîrokê da gelek tiştan dizane. Bila ew biaxive, tu jî

(1) Li Agirîyê du pirsên bi nav û deng hene ku mezin ji biçûkan dipirsin, “Evdalê Zeynikê kurê kê ye?” û “Elajgir dîr e yan Zêdka?” Elajgir û Zêdka heman cih in.

Peyvên kêmnas yên Pasûrê-3

Bahoz Baran



Amadekar:

Bahoz Baran

Zarbêj:

Kemal Polat

Herêm:

Masirto/Pasûr/Dîyarbekir

Temen: 91

Zarbêj:

Xanim Taman

Herêm:

Masirto/Pasûr/Dîyarbekir

Temen: 64

Sempûsek:

n.z>m.

Bastêqê nivîştî. Sempûsek zêde ji ber ku li hev alî-yaye, şekir pê digire. Gelek caran ji parçeyên bastêqî yên qetîyayî çêdikin û bêhtir ji bo zarokan çêdikin.

Nimûne:

Ji me ra çend heb sempûsekan jî çêbike.

Çilmalxwey:

r.z>nt.

Mala ku çil heb xweyîyên wê hene. Bi maneya mî-rata ku pir xêr jê nayê û kesên mezinên wan nînin dibêjin.

Nimûne:

Çilmalxwey in, mirov nikare here civata wan.

Sersîsik:

r.z>nt.

Kesê kêmaqil, kesê ku aqilê wî bi qasî sîsikê ye.

Nimûne:

Evî sersîsikî, dîsa li serê me bû bela.

Qûnteqî:

r.z>nt.

Kesê ku qûna wê/î dişibe teşîyê, di jor da gupokî ye, ber bi jêr ve zirav dibe. Bi maneya kesên ku tiştêkî nakin û forsa xwe rewa mirovî dikin jî dibêjin.

Nimûne:

De ji xwe ra li min û li vê qûnteqîyê!

Biraxwê:

n.z>m.

Xwişk û bira. Ji bo tevan tê gotin. Ji bo kesên nêzî mirovî ne, ku dostanîya mirovî bi wan ra heye jî dibêjin.

Nimûne:

Hin biraxwêyên min li Seyrantepeyê dimînin.

Şevlewend:

r.z>nt.

Kesên ku dereng derin qonaxan.

Li xwe dikin derengî.

Nimûne:

Kuro tu şevlewend î, ev seeta qonaxan e?

Xacîgark:

n.z>m.

Hesinê ku datînin ser kuçikê, ji bo ku beroş û niqran dayînin ser.

Nimûne:

Xacîgarka me xwar bûye.

Sîseban:

n.z>m.

Afat, tofanên mezin.

Nimûne:

Tu binêre ez ê çî sîsebanan bînim serî wî.

Çetik:

n.z>m.

Ji mûyê bizinan çêdikin. Diavêjin ser milên xwe, tûrikê biçûk e, dewçinê dîkinê.

Nimûne:

Min çetika xwe li çolê ji bîr kir.

Nîvtûrik:

n.z>m.

Wekî çetikê ye lê hinekî fireh e, diavêjin ser milên xwe û tişt miştan dixinê.

Nimûne:

Van tiştan jî tê xe nîvtûrika xwe.

Dubên:

n.z>m.

Ji herîya spî û reş tê çêkirin, çetik û nîvtûrikê pê girê didin û diavêjin ser milên xwe. Qulpê wan tê hesêb.

Nimûne:

Wê dubênê bi vê çetikê ve girê bide.

Dewçin:

n.z>m.

Cîyê dewî ye, ji postê karikan tê çêkirin, biçûk e, tê da dewî dibin ser erdan û baxçeyan.

Nimûne:

Ka wê dewçinê bide min.

Kun:

n.z>m.

Wekî meşkê ye, lê ji çermê nêrî tê çêkirin. Rûn pê nakeve.⁽¹⁾

Nimûne:

Kun xwe nagihîne meşkê.

Totang:

n.z>m.

Çûkek e, wextê dengê wê tê bihîstin dibêjin pez ji axuran berdin, bihar e.

Nimûne:

Totangê deng li me dike.

Kars:

n.z>m.

Karsa çilziman.⁽²⁾ Tewirek ji çûkan e, li cihên çîyayî distre. Rengê wê gewr e, ji kewê biçûktir e, wekî kewan şift û neqş li baskên wê hene, belotan dixwe.

Nimûne:

Kars, wekî berê nemane.

Dugo:

n.z>m.

Darê dudev, yê wekî çetalê ku pê dirî û xiştik miştikan top dîkin.

Nimûne:

Dugo nebe, ev dirî safî nabin.

Heftqat:

n.z>m.

Parçeyekî hûr û rovîyan e ku şûştina wê zehmet e û “hefbûk” jî dibêjine.⁽³⁾

Nimûne:

Heftqata xwe baş paqij bike.

(1) Meşk, ji çermê bizinê tê çêkirin û rûn pê dikeve.


(2) Li gorî bawerîya xelkî ev çûk, bi çil zimanan dizane û bi zarê hemû heywan û însanan dike. Li ser gûniyan venîştîye, strî di canê wê ra çûne, loma xew lê herimîye û guh li candaran kirîye. Wextê tê li perê gundan vedinişe û deng pê dikeve, xelk dibêje, “Karsê, însela te xebara xêrê anîye.”

(3) Dibêjin, heft bûkên melayî li heftqatê hatine hev, lê wan nekarîye paqij bikin. Êvarê şiv hatiye ber melayî, bala xwe dayê ku heftqat tevî pisîya xwe, wa ye li ber e. Melayî gotîye, “Ez xweyê heft bûka me, heftqatik tevî sergîn anîne danîne ber min!”


Pêkenokên

Xîya⁽¹⁾

Elîf Gunduz



Gundê Xîya



Zarbêj: Qedrî Gunduz

Berhevkar: Elîf Gunduz
Zarbêj: Qedrî Gunduz
Temen: 51
Perwerde: Nexwende
Herêm: Pasûr/Dîyarbekir
Dîroka berhevkerinê: 2018

1 Meseloka alî herçû

Xîya diçine karvan, dizivirin sar e. Serê qirê pahîzê ne. Tên cîkî şeveder dimînin. Werîs davêne ser xu, alî herçû⁽²⁾ datînin ser kurê muxtar, divên⁽³⁾ bira germ bive.⁽⁴⁾ Serê şevqê tev radivin, kurê muxtar ranave. Divên:

“Îşev cîyê wî germ vi ye lê çima ew ê rave. Alî herçû serê vi ye!”

Diçin dihincînin, êê do na pêr miri ye ji sermana. Divê:

“Aa, înî qurbana te me, alî herçû jî se kurê muxtar vi ye, çima mir?”



(1) Xîya: Gundekî Pasûrê ye. Pasûr navçeyeka Dîyarbekirê ye. Xîya navê eşîrekê ye jî.

(2) Herçû: Mirov ji darikî çêdike, bi serê werîsî ve datîne.

(3) Divên: Dibêjin.

(4) Bive: Bibe.

Meseloka kêrûşkê


Xîya diçin nêçirê kêrûşkê digrin. Kêrûşkê digrin tînin kadînê. Kadîn jî bê derî ye, nîr didin berê. Nîr didin berê, serê şeveqê tên kêrûşk filitye çîye.⁽⁵⁾ Gazî jîrkê xu dikin, divên:

“Kêrûşik di ku ra çîye?”

Li vî alî der e, li wî alî der e, de derê kadînê vekir-ye, dar li berê he.

“A divê xudê qulka şûna kulavera çîye.”

Qulka şûna kulaver jî ev qasahe biçûk e.



2

Meseloka torbê ar

3 Rojkî jî, wê çaxê, kut hevûne kut. Sitûn hevûne binê goma da. Torbê ar danîne ber sitûnê. Danîne ber kutê, bûk jî teze anîne. Deweta wê kirine, çîye ku ar derxe. Diçe teveqê dive torbe dixê deskî xu vî alî kutê ra dive, yekî jî vî alî kutê ra, dive davê teveqê. Dike nake nizane destê xu ji teveqê berde o awsa berê dimîne. Gazî dikin jîrkê xu, divên:

“Em çawa bikin? Em kutê bibirin, em çawa bikin?”

Divê:

“Wele na, kutê mebirin, ew ê xanî heloşe. Em ê milê wê jê kin!”

Ku divê em ê milê wê jê kin jinik tirsana teveqê berdide. Destê wê ji kutê filite.

“A divên em qurbana bûka xu, ne bûka me, ji me aqilîtir vû.”

Jor da xu davêne serê, ê de çend hev in. Heta ku radivin jinik binê wan da mirîye.

(5) Çîye: Çûye.

(6) Helkirin: Hûrkin.

4 Meseloka kûsî

Kûsî diqefêlin nizanin çi ye. Tînin tên ba jîrkê xu. Jîrkê wan hevye jîrkê pirsê. A tînin balê divên:

“Vîya çi ye?”

A divê:

“Çevê we rijîyano, hûn zanivin ez ê bimrim hûn ê bêaqil herin ji dinyahê. Evya kew e, deştê da mahe, pûrta xu weşandîye û bivin helkin⁽⁶⁾ bikine ber denîyê nokê reş ku çi xweş e.”





چاره رکرنا روپین خرابکر و
نه جوان ل نک زاروکی ب رییا باوهریال دهقه را
بههدینان دا



جهمیل شیلازی

Bersivdank

